Kurdistan
Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin
PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957
Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (250) | Tebax / 1-8-2023

# Bilindkirina nirxê sotemeniyê barê welatiyan girantir dike



**Kurdistan-Ehmed Elî**

Li Kurdistana Sûriyê, hevdem ligel bilindbûna nirxê sotemeniyê, kirêya çûnûhatina bi otomobîlan zêde bû, Welatî jî gazinan ji zêdebûna nirxê çûnûhatina otomobîlan dikin. Rêveberiya Partiya Yekîtiya Demoqratîk PYD roja 16ê Tîrmehê nirxê benzînê ji sedî 100 zêde kiribû, pê re jî nirxê her tiştî zêde bû. Ligel bilindbûna nirxê dolar û daketina lîreya Sûrî jî, rewşa Welatiyên Kurdistana Sûriyê zehmetir dibe.

> Bilindkirina nirxê sotemeniyê kirya çûnûhatinê zêde kiriye

Di nûtrîn pêşhat de jî kirêya çûnû hatina di navbera bajarên Kurdistana Sûriyê de û kirêya taksiyên nav bajar jî bilind bû. Kesek ku karê şofêrtiyê dike wiha li ser vê mijarê dibêje, berya niha kirêya di nava bajar de 1000 lîre distand, lê niha wan kiriye 1500 lîre. Benzîn biha bû û nirxê dolar jî bilind bû. Me nedixwast ku kirêyê zêde bikin, lê me ji neçarî kir, bi rastî em bi vê yekê ne dilxweş in ji berk u bandore li xelkê û karê me jî dike, lewma pêwîste aliyên peywendîdar sînorekî ji vê buhabûnê re deyne, ji berk u rewşa abûriya xelkê gelekî xerab e. Li tevahiya navçeyên Kurdistana Sûriyê û piraniya navçeyên Sûriyê nirxê yek dolarî gihştiye 13 hezar lîreyan. Welatiyî jî gazinan dikin ku kontrola vê rewşê nayê kirin ku zeremendê yekem yê bilindbûna dolar welatî ne. Welatiyek din jî wiha dibêje, bi rastî ew pereyekî zêde didin heta ku çûnhatinê di nava bajar de dikin, û ev yek jî bargiraniyeke zêde li ser milê wan e, lewma ev rewş nema tê tehemulkirin, û pêwîste nirx werin kêmkirin heta ku xelk bi hesanî jiyana xwe derbas bikin û rastî pirsgirêkên abûrî nebin.

> Welatî gazinan ji zêdebûna nirxê çûnûhatinê dikin

Rêveberiya PYD nirxê benzînê ji sedî sed zêde kiriye ku berî niha litra benzînê bi 225 lîreyan bû, lê niha bi 425 hatiye destnîşankirin. Ji destpêka îsale ve jî, ev cara çaremîne ku ev rêveberî nirxê sotemeniyê bilind dike.

**7 sal bi ser teqîna Qamişlo ya Taxa Xerbî derbas dibin** *Rûpel—2*

**100 saliya Peymana Lozanê** *Rûpel—3*

**Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê sêyemîn kongreya xwe li Qamişlo lidar xist** *Rûpel—4*

# 7 sal bi ser teqîna Qamişlo ya Taxa Xerbî derbas dibin






**Hêvî Delî- Qamişlo**

Di 27ê Tîrmeha 2016 an de, xelkên bajarê Qamişlo çavên xwe li ser bûyereke herî bi êş vekirin ku teqînek bihêz bi rêya kemiyoneke bombekirî ji aliyê rêxistina terorîst a Daîşê taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo hejand û bi dismaleke reş ezmanê Qamişlo tarî kir ,ku di encamê de bi dihan ji welatiyên sivîl şehîd ketin û bi sedan kes jî birîndar bûn. Û ji bi hêzbûna dengê teqînê xelkên Qamişlo daketin kolanan û dengê qêrîn û hêsrên dayîk û bavan li nava bajar û bajarokên Kurdistana Sûriyê de hate bihîstin û xwîna şehîdan li ser dîwaran hate nexişandin.

Lê herwiha dibe cihê pirsê ku ev bûyera li Qamişlo hatî rûdan 2016an de, heta niha jî nezelalî li derdora wê ye ku çawa kamyonek bi 14 ton teqemenî barkirî di rêya kolana Amûdê re ket hundir û gihîşt navenda bajêr,û bi hêsanî xalên kontrolê yên PYDê derbas kir û xwe li taxa rojava û di nav mal û dikanên bajêr teqand û bû sedema kuştin û birîndarbûna bi dehan welatiyên sivîl û ziyanên madî di nav bajêr de.

Tevî ku wê demê PYDê biryara qedexekirina ketina kamyon û otombîlên mezin dabû navenda bajêr, lê kamyona bi teqemeniyan barkirî karî xwe bigihîne navenda bajêr li taxa rojava.

Û hêjaya were gotin li kolana ku teqîn lê rûda bi navê kolana azadiyê dihat naskirin ku di destpêka şerê Sûriyê de 2011 an, bi hezaran keç û xortên kurd komdibûn li pêşiya mizgefta "Qasimo" bi yek dengî banga maf û azadiya gelê kurd dikirin.Û her sal di 27ê Tîrmehê de careke din birîn nû dibe û bi dilekî bi êş û xemgînî çîroka şehîdên kumkûjiya Qamişlo 2016an ,li heman cihê teqînê tê bi bîranîn û wêneyên we li ber çavê her mirovekî de dimîne.

# Nexweşên penceşêrê li Kurdistana Sûriyê ji giranî û nebûna dermanan dinalin

**Kurdistan**

Nexweşên penceşêrê li Kurdistana Sûriyê bi zehmetî xwe dermanên xwe peyda dikin. Dermansaz jî dibêjin ku derman peyda nabin û eger hebin jî bi nirxekî giran têne firotin û her kes nikare bikire.

> **Nebûna dermanan rewşa nexweşên penceşêrê zehmetir kiriye**

Merivên nexweşan jî dibêjin, ji ber nebûna navendeke taybet ji bo nexweşên penceşêrê û nebûna dermanan, ew neçar in ku biçin Şamê. Li Kurdistana Sûriyê pirsgirêka peydakirina dermanên penceşêrê heye, nexweş jî dibêjin, ji ber ku dermanê penceşêrê nîne, ew neçar in her carê berê xwe bidin Şamê.

Welatiyek derbarê dermanê penceşêrê dibêje, em li dermanê penceşêrê geriyan, me nedît. Li ti dermanxane û nevendan me nedît. Em neçar bûn biçin Şamê, riya Şamê jî gelekî zehmet e û bi firokeyê çûn û me pereyeke zêde xerc kir.

> **Nexweşên penceşêrê daxwaza alîkariyê dikin**

em ji neçarî çûn nexweşxaneyeke taybet ku gelek biha ye. Welatiyek din jî dibêje, ji bo dabînkirina dermanan ji bo nexweşê xwe yê penceşêrê ew gelek zehmetiyan dibînin, pereyên zêde jî xerc dikin, lewma pêwîste alîkariya wan bê kirin bi hezaran rêxistinên navdewletî li deverê kar dikin,lê ti rêxistinê li rewşa wan heta niha nepirsî ye, herwiha divê hêsankarî ji bo wan were kirin heta ku xwe li Herêma Kurdistanê çareser bikin.





M.Salih Şelal

# 100 saliya Peymana Lozanê

Peymana Lozanê peymaneke aştiyê bû ku li 24ê Tîrmeha 1923an ji bo çareseriya arîşeya Anadolê û parçekirina Emperatoriya Osmanî di navbera hevalbendên şerê cîhanî yê yekem û civata netewî ya mezin ya Tirkiyê li bajarê Lozanê hate morkirin. Diyar bû li gor bercewendiyên nû yên hin welatên bi serketî di şerê cîhanî yê yekê de mîna Brîtanya û Fransayê ew tiştên di peymana Sêvrê de hatibûne pesendkirin, hatin helweşandin û paşguhavêtin.

Lewra, giringe berî em behsa naveroka peymana Lozanê bikin pêwîste em hinkî vegerin paş û bahsa peymana Sêvrê bikin. Roja Sêşemê, 10ê Tebaxa 1920an di holeke nîşandina berhemên kargeha niştîmanî ya porselanê li Sêvrê ya bi ser bajarokê "Versailles" yê nêzîkî Parîsê, ji bo nûnerên hevpeymanên serkeftî di şerê cîhanî yê yekem de ligel mîratgirên Empreratoriya jinavbirî ya Osmanî hate xemlandin, mebesta vê komcivînê ew bû îmzekirina peymana aştiyê. Paşê navê vê peymanê wek peymana Sêvrê hate binav kirin di navbera hêzên hevpeymanan û Tirkiyê de, di dîroka hevçax a Rojhilata Navîn, Ewropa û Efrîqayê de cih digre. Welatên hevpeyman yên li ser vê paymanê îmzekirin ev bûn, Emperatoriya Brîtaniya, Fransa, Îtalya, Japon ligel hevpeymanên wan yên din: Ermenistan, Belcîka, Yûnanistan, Şaneşîna Hicaza Haşimî, Polonya, Portogal, Romanya, dewleta Sirbî, Kirwat, Slovînî, û Komara Çîkoslovakya, li hember jî nûnerê Osmaniyan.


Berî vê û di Gulana 1919an de demezrênerê komara Tirkiyê li Samsûnê şerê rizgarkirinê dest pê kiribûn bi serokatiya M.Kemal wek lêkolîner dîroknas Ozhan Eycan bahs dike, "yanî diyar e ew ne razîbûn ji peyman Sêvrê".

Wê demê Brîtaniya û Îtaliya "Qestentîniye" Stenbola niha desteserkirbûn biser ku agirbesta "Mondros" di 30ê Çirya Pêşin sala 1918an de di navbera Brîtaniya "nûnera hevpeymanan" û Emperatoriya Osmanî hatibû kirin, ji xalên têde hatibû danîn mafê olî û netewî ji bo kêmnetewan û olên cuda re li ser bingeha regez, ziman û ol bên parastin, şahê Osmaniya Mihemedê Şeşan li Stenbolê bû, bi fermaneke Ceneral M. Kemal şande Anadolê ji bo tinkirina nerazîbûnan, lê piştî çûna M.Kemal ew jî tevlî berxwedanê bû û serkêşya wê kir, û di 7ê Tîrmeha 1919an de dest bi şerê rizgarkirinê kirin, mîsaqa milî ragihandin û ji bo Kurd jêre bibin piştgir di 27ê Tîrmiha 1920an de biryar da *piştî bidawîbûna şerê rizgarkirinê hêdî hêdî otonomiyê dide welatiyên Kurd *li gor normên navneteweyî yên ku mafê çarenivîsa gelan destnîşan dikin, Kurd wê xweseriya xwe bi dest bixin).

Peymana Sêvrê bi van hevokan dest pê kir "li 30ê Cotmeha 1918an de agirbestek ji aliyê hêzên sereke yên hevpeyman bi Tirkiyê re tê dayîn da ku peymaneke aştiyê bê îmzekirin.

433 madeyên serke li ser warê cuda cuda pêkhateyên peymanê ne, ji bilî pêşgotinê peymana Sêvrê ji 13 beşan pêk tê.

Di başê sêyem ya taybet bi bendên siyasî de, kerteke taybet bi Kurdistanê heye û di navbera her sê madeyê 62, 63, 64an de mafên Kurdan hatine destnîşankirin. Di madeya 62an de, behsa wan cihan dike ku nişteciyên wan bi piranî Kurd in. Di madeya 63an de, Hikûmeta Tirkiyê tê pabendkirin di dema 3 mehan de biryarên komisyona ku di madeya 62an de hatine cîbicî bike. Madeya 64an behsa wê yekê dike ku di dema salekê de piştî cîbicîkirina peymanê, mafê gelê Kurd heye berî bide encûmena komeleye neteweyan û daxwaza xwe ji bo serxwebûnê ji Tirkiyê nîşan bide û dewleta Kurdistanê li ser axa Kurdan li Îraqê û Tirkiyê bê avakirin.



Lê mixabin ev peyman piştî îmzekirina endamê şanda Emperatoriya Osmanî ji aliyê Tirkiyê ve nehat pejirandin û di peymana Lozanê de nexşerêyeke din û pabendiyeke nû ya Tirkiyê hate çespandin.

Hevdîtinên peymana Lozanê di 21ê Çirya Paşin a sala 1922an de destpê kirin, nêzî sal û nîvekê dewam kirin û di roja 24ê Tîrmeha 1923an de peyman hate îmzekirin, peyaman ji alîkî ve di bin bandor û gevên belavbûna şoreşa Belşefîk de û ji aliyê din ve di bin bandora bercewndiyên Brîtaniya di petrola Başûrê Kurdistanê de hate îmzekirin. Ya herî balkêş di peymanê de ne ji dûr, ne ji nêzîk behsa keysa Kurdan nehtiye kirin û ti kesî nûneratiya Kurda nekiriye.

Ismet Înono, Serokê şanda Tirkiyê bû herwiha Wezîrê Bervaniyê bû, li wê derê gotiye li ser navê Tirk û Kurdan ez li vir im, û tekez kir ku çi daxwaz û gilî yên Kurda nîn in, jibilî wî jî endamekî şanda Tirkî bi navê Zulfî Zade û xwe wekû Kurd deye nasîn û gotiye "ku ew li ser navê Kurdan e û ti daxwaziyeke Kurdan nîne" yanî Înono û Zade bihev re Kurd li nava rastê bê war û welat hiştine.

Vê peymanê Bakurê Kurdistanê di nav sînorê komara Tirkiyê de hişt, wekû hatî ziman di peymanê de raste rast hîç behsa pirsa Kurdistanê nehatiya kirin navê Kurda jî nehatiye nîşan, tevî ku ji dewletên hevpeyman gelek îmzekar hene, lê belê bi navê pirsgirêka Mûsilê dihat gengeşekirin

Herdû aliyan Brîtanya û Tirkiyê li gor parastin û qizinckirina berceweniyê xwe dikirin, hikûmeta Enqerê dixwest bi kêşa mûsilê re bidestxistina Hinek mafên netewî yên Başûrê Kurdistanê pûç bike, ne ku mîsaqa milî biparêze.

Bicîbicîkirina peymana Lozanê sînorê welatên mîrategerê Osmaniyan hatin danîn di nav de komara Tirkiyê hate ragihandin û sînorê wê hatin destnîşankirin û Kurdistan di navbera Tirkiye, Sûrî, Îraq û Îranê de hat dabeşkirin.

# 40 sal bi ser enfalkirina Barzaniyan re derbas dibin



**Kurdistan**

Serok Barzanî ji bo salvegera 40 saliya Enfala Barzaniyan peyamek belav kir û ragihand, hê jî fikra şovenî û niyeta neman û êşandina gelê Kurdistanê em di xeyal û reftarên hinek kes û aliyan de dibînin. Di peyama Serok Barzanî de hatiye: Çil sal berê rejîma Be'sê di helmeteke nerewa û bêwijdanî de heşt hezar zilamên pîr û ciwan ên Barzanî, ji temenê neh salî heta nod salî, desteser kirin û bi awayekî nemirovî li biyabanên başûrê Iraqê komkujî kirin. Ew tawan beşek bû ji wan rêze karesat û qurbanîdanîna bi awayekî rêkxistî bi mebesta jinavbirin û helandinê bi ser gelê Kurdistanê de hatine, ji bêserûşûnkirina diwazdeh hezar ciwanên Feylî û Enfala Germiyan û kîmyabarankirina Helebce û navçeyên tin ên Kurdistanê bigre heta erebkirin û veguhestin û guherîna demografiya Kurdistanê. Mixabin, di demekê de ku çil sal di ser wan tawanên mezin re derbas dibin, hê jî fikra şovenî û niyeta neman û êşandina gelê Kurdistanê em di xeyal reftarên hinek kes û aliyan de dibînin, ew jî kêşeyeke sereke ya gelê me bûye ligel vê eqliyeta nemirovî ku çavkaniya êş û neseqamgîriyê ye ji bo hemû Iraq û navçeyê. Di salvegera Enfala Barzaniyan de pêzanînên min ji bo zarokên gelê me, bi taybetî cemawera deşta Hewlêr û Herîr û Soranê heye ku di rojên dijwar de Kurdane û merdane hevsozê Barzaniyan bûne û alîkariya wan kirine. Ez spasiya kesûkarên Enfalê û bi taybetî wan dayîk û jinên Barzanî dikim ku salên dûr û dirêj jana jidestdana ezîzên xwe tehemul kirin û bûn nimûneya bilind a xweragirî û rewiştbilindî û Kurdperweriyê.

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro duşemê 31ê Tîrmehê di salvegera jenosîdkirina Barzaniyan de peyamek belav kir û tê de ragihand, ev tawana mezin, beşek bû ji pêleke nijadperestî ya rejîma têkçûyî ya Be'sê li dijî gelê Kurdistanê. Di peyama Serokwezîr Mesrûr Barzanî de hatiya diyarkirin, îro çil sal di ser yek ji dirandetirîn tawanên rejîma berê ya Iraqê re derbas dibin, ku jenosîdkirina bi hezaran mirovên bêtawan ên Barzanî bû, tenê ji ber ku ew Kurd û Barzanî bûn, hatin desteserkirin û piştre li biyabanên Iraqê bi zindî hatin biçalkirin.

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê destnîşan kiriye, ev tawana mezin, beşek bû ji pêleke nijadperestî ya rejîma têkçûyî ya Be'sê li dijî gelê Kurdistanê, ku bêserûşûnkirin û jenosîdkirina Kurdên Feylî û enfalkirina navçeyên Barzan û Germiyan û Badînan û kîmyabarankirina Helebceyê û çendîn deverên din ên Kurdistanê, zîncîreyek bû ji wan tawanên hovane yên li dijî xelkê Kurdistanê hatin encamdan. Mesrûr Barzanî ragihand, cihê mixabiniyê ye ku piştî derbasbûna çil sal di ser vê karesatê de, hîn jî hinek kes hene bi heman eqliyet û hizrên şovenî û serdema Enfalê, dixwazin mafên rewa û destûrî yên gelê Kurdistanê binpê bikin. Di demekê de ku xelkê Kurdistanê bi hezaran qurbanî dane û rûbirûyî çendîn tawan û karesatên mezin bûne ji bo berevanîkirina nasnameya xwe ya netewî û niştimanî ku ti car dest jê ber nadin.

Serokê Herêma Kurdistanê destnîşan kir: "Bi hezaran malbatên Barzaniyan yên bê desthilat li kampa Quştepe, Behirka, Herîr, Soran û cihên din bê bav û bira man û bi hezaran jinên Barzanî bê mêr man û neçar bûn rûbirûyê çarenivîsekê ne diyar û dijwar bibin û li hember bi dehan derdeserî û nexweşiyan li berxwedan û bi tenê man."

# Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê sêyemîn kongreya xwe li Qamişlo lidar xist



**Kurdistan**

Roja 29-7-2023an li bajarê Qamişlo li hola Efrînê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriya siyemîn kongirê xwe li darxist bi amadebûna 52 endaman li hundir û 52 endam ji herdû nûneratiya ya Ewropa û Herêma kurdistanê di rêya Zoomê re.

Malpera fermi ya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriya belav kiriye, Piştî pêşwazî û rawestandina li ser giyanên şehîdên kurd û Kurdistanê û sirûda niştimanî Ey reqîb, serokatiya konigir hat hilbijartin. Li destpêkê serokatiyê çend xal ji bo karê xwe yên sereke destnîşan kir paş re belgefilmek li ser kar û barê yekîtiyê di qonaxa bûrî de ji bal mamosta Berzan Hisên ve hat weşandin. Herweha hat pêşniyar kirin ku navê kongir bibe kongirê Endamê Yekîtiyê nemir Mehmûdê Sebrî (Evîndarê Xemgîn). ji ber keda wî di warê wejeya Kurdî de. -Li gotina serokê berê yê yekîtiyê Luqman Yûsif ji kongirê bûrî ta yê nû hat guhdarî kirin.- Çend birûsk û pîrozbahî hatin xwendin ji wan: -Emer Koçerî-Ferhad Haco-Tevgera xwebûn-Rêzan Şêxo-Hesen Silêvaneyî,Liqê Dihokê û mamosta Reşad Bîco û Sekretêrê Şepêla pêşerojê.-Pêşnûmeya peyrewa navxweyî ji layê komîteya amadekar hat pêşkêş kirin-Rêpêdan û derfet dan ji bo endaman ku pêşniyarên xwe diyar û gengeşe bikin ji bo dengdanê. Piştre çend xal di peyrewa navxweyî de hatin biryardan li gor dengdanê hatin guherîn: Yek ji wan biryaran ku şûna herdu şaxên herêma Kurdistanê bibin Nûnertiya Yekîtiyê li Herêma Kurdistanê. Herwihaa komîteyek hat hilbijartin ji 6 endaman ji bo xalên hatîn zêde kirin û pejirandin di peyrewa navxweyî de. -25 endam 5 ji wan ji nûneratiya Ewropa, û sê endam ji bo nûneratiya Herêma kurdistanê hatin destnîşan kirin. -Dengdana endamên xwe kandîd kirîn ji bo rêvebiriya nû yên serkeftî hatin pejirandin.